Bi helkeftina bîranîna 45 salya şewata sînema amûdê :
milletê amûdê jiyan da evê helkeftinê bi serdana sînemê û vêxistina mûman û danîna gurzên gulan li ser pûtê pakrewana û bi vî awayî (koma amûdê) ya çandî û hunerên kurdî hefteyeke rewşenbîrî li darxist .

destpêka çalakiyên hefteyê ji /14/11/2005/ bi kar hat , û programê hefteyê jî bi vî şêweyî hate amedekirin :

14/11/2005/ şeva yekemîn mamoste (Hesen Dirê'î) amedekarî da pirtûka xwe ya bi navê (amûda tehteriq) , û li pê jî danin û stendin bi pirs û bersîva şevbihêrk pir dewlemend bû .

15/11/2005 / şeva duyemîn mamoste (Arşek) şirova rêzanên rêzimanî ji pirtûka xwe ya bi navê (zar û ziman) bi ravekirin da û bi raweyek fireh pirsên ji darêj û mijadên pirtûkê jê hatin kirin , û eve mijada wî :

berî her tiştî silav ji rêçanên helbestê
ji wer bibarin xunav ji gûmanên xuristê

rewşenbîr û nivîskarên hêja ...guhdarên pêşveřû..

mijada min mebest û xwesteka gelê mine..
pêwîste ku em jî mîna hemû kesên cîhanê li rêzimana xwe bikolin.
Ereb şemo û Celadet bedirxan û Kamîran bedirxan-Qenatê kurdo-Reşîdê kurd-Osman sebrî û piř zanyarên din yên xwedî hêz û bîr û bawerî ji mere Bûne ronahiyeke ber bi çav û xuyanî,divêt em jî li pê wan di vê ronahiyêde şopgêr bin, da em pêşve biçin...
lewra min jî ev daxwaza gellê kurd bi miqatyî bi cî aniye çiku kurd li hunkûfî rêzimaneke rastgêrin.
rêzimana her zerekî xurtiya wî zimanî bi rêzanên zimanî dide xuyanî..
weke ku hatiye nasîn : rêziman nivîsan tîpên latînî di zimanê kurdî de bi pêşketina demê ře bi kar anîne ..31 tîp ji A B C ya kurdî ře danîne,
û rêzanek di rêzimana kurdî de jî heye eve şirova wê..(zimanê kurdî zimanekî axavtî ye û peyvî ye) dêmek çitove têt bi lêvkirin weha jî têt nivîsandin,
ji evê nasînê têbîneke bi wate dertê..piř lêkolîner jêre mijûl dibin û li ser di ponijin.
eger em rêzanê neşkînin û durust bi cî bînin..hin tîpên din ji pêvî 31 ên berî gerekin, wekî bilêvkirina tevayên herêma ji welêt.
mînak: tîpên Ç K P T
di nerîna min de ji kêferata hay û hestan pêjna cêwîdara jê dikim,
TÊBÎN: alava (dar) di zimanê kurdî de arziyê dide xuyan,
Wek: ez maldarim, dêmek ez xwedî malim..ez mal samanim
Balo cêwîdar rezberya xwedî cêwî dide û cêwî jî evin:
Ḉ Ḱ Ṕ T́
mînakin jiboyî ravekirinê: ço- dengenave jiboyî ajotina Kere

ḉo- dare,ş́ive
kar-ḱar
par-ṕar
tar-t́ar
eger em hîn kwîrt́ir jî dakevin emê bibînin ḱu ev tîṕana
li gorî ṕîvan û endazyê, di dawiya hemû got́e û bêjeyan de
dibin cêwî tenê û ev jî taybet́mendiyeḱe zimanê kurdî ye
jiber ḱu bilêvḱirin û ji devderḱirina tîṕên cêwî..Ḉ-Ḱ-Ṕ-T́
sert́ û kurt́ û siviḱ û zû dert́ên ..zarav bi wan zelal dibin
lê cêwîdarên Ç-K-P-T ..bi asayî..nerm..dirêj û giran dert́ên
li gor biçima(fonît́îḱa)berhemên tîṕan û weş́anên pêllerzên wan.
Weḱ:leḉ-pûḉ-sernûḉ tîṕa Ḉ
ḉeḱ-seriḱ-ş́ayiḱ tîṕa Ḱ
geṕ-ş́oṕ-diloṕ tîṕa Ṕ
kat́-pêt́-civat́ tîṕa T́
û ya dît́ir..ABC ya kurdî du beş́ên tîṕa t́êde hene:
1-beş́eḱ ji celebê BCÇ D...bê dengin yan jî deng xwazin,. çiḱu eger
dengeḱ ji evan tîṕanře nebe pêş́gir yan jî paş́gir , ev tîṕana bi lêvḱirin
nabin û ji dev der nayên,
ev tîṕana bi dengdara deng didin.
2-beş́ê ji celebê A Î Û O evana jî .8. tîṕin .bi sê nava nas dibin:
1-dengdarin:dêmeḱî xwedî dengin.
2-dengdêrin:dengeḱî ji dev derdixin û li ber bayê didêrin.
3-dengderin:dengeḱî didin der (derdixînin).
_taybet́mendiyeḱe zimanê kurdî heye ḱu hevbende û hevbendiya got́e û bêjeyên evî
zimanî ji tibabên babet́ û curane ,û ya hîn zort́ir jî ..bindest́iya kurd û set́ema ḱevnar
ya ḱu hat́iye ser..bûye sedemeḱe mezin bandora xwe daye liv û bizavt́ina rêzanên
rêzimana kurdî û bi vî awayî rewanbêjya ziman û zarxweş́ya wî lawaz ḱiriye,aloziyên
giran t́êde peyda bûne, ev muḱurhat́ineḱe ji kurdan teva t́ê xwest́in,
dêmeḱ ast́engî di riya lêkolînerên rêzimanê de gov û kom bûne, wêranḱirin asaye lê
avaḱirin zore.. zaravên herêmî û rêzanên zimanên
hogerên hawêrdorî kurdist́an bi nifş́an xwe di nava zar û zimanê me de bi cî kirine,
ango zimanê me kurda tar û mar ḱirine,
lê tevlî evan zort́engiyan jî hîna got́e û bêjeyên kurdî yên maḱî û hin ji malbat́ên
rêzimanê yên koḱî û bingehî li serxwe mane, ew baẍên hêvî û omûdewera lêkolînerên
ziman av didin,.
hêzên ḱet́aḱet́ wirceќe ḱêm û hindiḱ û hodebûneќe demxwaz ṕê digihêjînin..
lê kareḱî hevbeş ji saxt́man û dezgehên welat́î girînge, û têḱiliyên
rewş́enbîrî di nava ẍêzḱ û têlbiřên welêt́ de dîsa girîngin, tevde jiboy rêzgariya zar û
zimanê kurdî..,.

davdiliyên dilsozî jiboyî we

û siṕas

15 /11/2005

ARŞEḰ

16/11/2005/ şeva sêyemîn helbestî bû :
1- amozê (Şêrîn Gêlo): helbestên xwe bi navê (amûdê-diyariyek ji boy hebesvan " Dil êş" –diyariyek ji boy hunermend "Şeyda" – diyariyek dîtir ji boy hunermend "Şeyda" – Sofî Elî dûbare bû – û hin pirtên helbestî) û eve hebesta (Sofî Elî) :

De Lorî

De lorî berxê bavê nino lorî
Ez bi gorî destê pênûsê de lorî
Ez bi gorî cilê qetyayî de lorî
Ez bi gorî nigê xwas
Zikê biçî
Qirka ziwa
Çavên tirsyayî de lorî
Û de banke sofî elî de banke
Werin kezebê şewitî
Werin sinbilê dila
Ey sofî elî tu çi
Difroşe
Barê te ne tê kirîn û ne tê firotin
Werin kezeba şewitî
Werin lepê kîvroşkan
Werin baskê çivîkan
Werin peryê hec hecîkan
Hey Lo sofî elî debanke
Dengê te dewla xwe
Ji bîra temenê me dadigre
Banke hewar agir sinbilê dilê me dixwe
Agir avêt mizgeftên bajar
Agir bajar ji berêvde xwar agir avêt kirasê ke'ibê
Agir avêt kefenê pêximberan
Ew kiyê agir di herçar aliyê jiyanê de dadaye

Wê kî avekê li vê dojehê ke
Bîna kizûrî ji singa xwedê di fûre
De banke sofî elî de banke
Werin şekirê cejnê di lepên
Vala de deynin
Cejnek din di ser van lepan de
Derbas na be
Werin balgehek nerim
Di bin vî serîxin
Zemînek cemidî di bin van lingan xin
Werin çavên xwe bi vê komirê
Kil bikin ta ev çav nema xewê bikin .

Şêrîn gêlo

2 – amozê (Nesrîn Têlo) : du helbest bi navê (evîna sor – pêşmerge) û çîrokek bi navê (bîr anînên dûr ji boy Amûdê) û hindek axaftin li ser bûyera sînemê , û eve çîroka wê ev bû :

Jı Bîranînê dûr

Sê kılîtê Amûdê li nik min hebûn,her kilîtek yê şehnamekê bû , ewan li gel hev şahinşahîya dil û bîranînên min bûn , dema tête gotin (mala me li Amûdê) …di cih de hewşekî berfireh tête ber çavê min , gulzareke rengîn ,û hevristek bilind di ortê de ..ji wê bilindiyê dınêre ü sılavêt şîn û geş ji germahîya rehan bi rêve dike ji Amûdê re hemû mal bi mal .

Kûçkek delalî bi nav û deng navê wî Qero bû , di de dîf şehlewendê zılama dilêrê mêra (bavê Zınar)ew e bû yê xakê xwe digirt di bin pêngavêt wî yên pir bawer .

Tox …dîdevan …û çend tîpêt ron ...di din dîf hev ,li rûpelê hatavê rêz di bin gotinek ...ewe ye destpêk dûmahîya min .

- Amê hoşyar : mala wî li ser stûnê mehrebanî yê avabi bû .li ser textê şahiya wî , Zeyosê evîndara rûniştîbû , navê Rojîna xwe li ser aso datanî û textê wê li nik Zîn û Julyêt rêz dikir .

Çendî zaroktîya min ban wan dikir da dagerin da bizîvirin da ez li nik wan rûnim di hentûrê raxistî bi qedîfê ercıwanî . an li sendelîya teniştê rûnim nik fenerê heştkujî , bi çîrayê wî yê zerevî . li dengê nigê hespê xemilandî guhdarî kim , û ajovanê qamçî di dest , carekê bi wî sêwlekan di tirsand û carna hespê xwe bi wî haydar dikir . wase dil aram di bû di xweşîkî mîna xweşîya xewnêt şêrîn .

- Xalo Helîm : dergeha şahîyê ..çırûsîya cejnan .. nişana şîkbûnê .. dema xatir ji

civate dixwest dilan çand gav bi dîfre diçûn . wesa xalê min di hişê min mabû rewşekî taybet û dengekî cuda li ser pêlelerzêt gerdûnê de .

dema dayka min amadîya me dikir da em bıçin aMûdê , çavêt min bi dîf tevgera wê di man , û bi îk carîya rêz û perwerî ez rûdiniştim mîna ku ez li perestegehekî pîroz rûniştî me . lê sema dilê min bavê min tenê di dît nizanim .çima ew Amûdê di dît warê derdê giran û bîranîn bi êş . ??

ji bre hindê pişta kêfa min hinekî kivan di bû

û bi taybetî deme carekê dengê wî hat ûgot: zaro çendî bi kêfin,mal ne xeraba tu dibê wê biçne Parîsê

ez ketim nav ciha lê xewa min ne hat .. ez mijûl mam bi wê gotnê : mana xwe kêfa me ne li gorî bejna Amûdê ye ?? duver Parîs .... aya eweye pîvoka espehîyê li cîhane de ??

Ta dayka min hat da betanî yên din bi me daka mîna adeta wê di zivistanî dît ku ez şiyarim ...bi dengek nevî got :(razê qîza min da tu min şiyarke sibehî zû) . lê min ceger kir vê carê û min bi dawdêla wê girt û min pırsî (Da .. bo çi baba hej Amûdê nakî) ? mat ma û duver got na ew jî hej Amûdê dike lê ji ber wê bêrîya me bike wesa digot . ji nûve pişta kêfa min hinekî rast bû , û ez di xewde çûm .....

Wesa Amûdê yaqûta dil bû , û her dem kimankirî bo bi romansîya xewnên şêrîn ta qîrînîya wê bi ser guhê me de hate xwar mîna birûskekî tund. Bi ser komerkırna sê sed zarokên wê di etûnê sînemê de , yên bêhtir jı demokek reş werne girtin ji demê de . Dayka min kete şûneke giran bi ser zarokê xalê min , lê bavê min ma bêhtir li me bana û ma bêhtir û ma bêtir me di parêze , mîna ku ma li ser me dutirsî ji şewtên din , şewtê ji nişkêve .

Piştî wê hevgerîya rıncor , gelek mal ji Amûdê koçkirin yek ji wan mala xalê min bû .

Deh sal bûrîn .. carek min dît ji nû ve ez li Amûdê me , tiştek tenê min xwest , serdana goristanê .

Di naw goristana bê ser û bin de .çûn dilê min destê xwe li ser her selîn dibir ta li ber selînekî venişt , navê herdû zarokê xalê min li ser bûn , dilê gerdûnê vexumî û tiştek nema . az ketim malkî mezin , mirovan lê rawestî di xewde çûbûn , dem ber bi êvar bû , pencerek bi tenê li wê malê de habû . ez bi alîve çûm ta ez gıhiştim , li hêla din gerdûnek din min dît , roka wî di orta ezmana de bû . Serfiraz li wira rûniştî bû , verêja şewatê di dest bû , min bankir serfiraz : li min zîvirî .

Min verêja wî jê xwest , bi alî min ve hat û verêj xiste destê min . lê min ne şiya bû tiştek bixwînim , ji ber roj hin bi hen diçû ava . û hindir tarît tir di bû , min mûmek derxıst û min got : xizme , mûmê bo min vêx . dema dangê kevirhest hat leşkerê li ber pencerê şıyar bû , û mûma min kir armanca devence xwe , min bankir : serfirazî

Serfirazî pişta xwe da min û çû .....

Dema çavet min vebûn , ez rawestim , lê dilê min ma venişti li ber selînê . min rahişt dilekî pêçandî bi xwînê û min kilîtê Amûdê winda kirin di lehiyek ji rûndikan.

Nesrîn Têllo

3- mamoste (Arşek) : tibabek ji helbestan pêşkêş kir ji helbestên wî jî (birîna dil wlate – dikalin em - hey welato - qlenê fedraliyê – gul distirê – helbestek li gel hokerên ziman) û evin du helbest ji yên wî :

Helbestek ji boyî we xelat

Werin bixwînin tîṕa
Fêr bibin meḱin rîṕa

Tîṕên girs û tîṕên hûr
Teva berdin binê t́ûr

Kesê bi zaneb vana
Wê bibe jîr û zana

Emê bêjin tîṕa (A)
Biçûḱ mezin weḱ bira

Tîṕa (BE) jî tibabe
Got́e bêyî wê nabe

Celeb bi (CE) t́ê xwendin
(ÇE) dide raveḱirin

(ḈE) jî cêwîya (ÇE) ye
(CE) ji wan re derge ye

li (DE) hûn xweş biḱin rav
(E) bi(Ê) re gav bi gav

Ew herdû tîṕên dengdar
Liv dane zaravên zar

(FE) desţṕêḱa ferhengî
We li (GE) pirsî kengî

(HE) jî ji hay û hesţe
(Î) dengdare na wesţe

(I) nakeve pêşiyê
Ḱin dixwaze xweşiyê

Jan û jînê (JE)çêḱir
Kar jî bi(KE) desţ ṕêḱir

(ḰE) ḱa ji ka ḱir cuda
(GE) bingeha wan dida

(LE)û(ME)û(NE) bê deng
Bi dengdara dane deng

(O) dengeḱî dirêje
ji bîra xwe navêje

(PE) jî ji (Ṕ E) cihêye
lê li dawî weќ wêye

(QE) derṫê ji jora dev
(RE) bi zimanre direv

Jibîr neќin (SE)û(ŞE)
Ezber biќin jiboy xwe

(TE)û(Ṫ E) jî cêwîne
Ji dengdar bi hêvîne

Dengdare (Û) bi awaz
(U) ќine lê wê bixwaz

Herdû jî nabin serkêş
Boy tu goṫeya li pêş

Verêj û vir (VE) divê
Tew girînge boy şevê

(WE) û (YE) du girêќin
Denga bi wan cihêќin

Xebaṫ bê (XE) maye baṫ

Ẍher diќe kêferaṫ

(ZE) jî ma kaṫ ji zar re
Xwe qels neќin ji kar re

Ṫêbîneќ bê dirave
Rênivîsa her gave

Arşeќ

Qelenê federaliyê

Dwazdê avdarê
Sura bayê setemê
Dîsa rabû
Bi kuştina zarokên .....
Bê guneh ,
Dest pêbû

Lê li rêjîmê
Vegeriya ,
Bû babîsokek
Hêrs.... û huner....
Dinavre ... difiriya
Dengê belengazan
Şiyarkirin
Bi qêrîn û ...
Bi mêranî ...
Tev çol
Û...tev ...çiya
Hêzên çekdarî ...
Weşên paşverû...
Li rû çerxa demê
Li hemberî .... kevir ... û ... kuçan
Ranewestiyan
Awazên serhildanê...
Ji qamişlo .....
Gihîştin
Efrînê ... zorava...
Û vegeriyan... kûbanê
Agirê tîndayî..
Hate dadan
Li amûdê ... reşmizgînê
Da berxwedan
Tirbesipiyê ... dêrikê
Bajar û gundan .
Hawar û ...
Qêrînên
Serê kaniyê...
Bersîvên ... derbêsiyê
Talanên eynsiça
Pirsên ... til temir
Û ya herî giran
Bêsûckirina
Serdar û ... leşkerên dujmin
Yên dest bi xwîn
Bûn sedema ku ....
Li her çol û bejan
Bû ... halan û ...talan
Li zikak ...û
Kolan ... û duryanên welat,
Toş rabû ....
Paşveruwên ereb
Yên bê celeb...

Wêran kirin ,
Komarên bi rûmet
Berbat kirin ...
Kovarên bîr û ramana
Yên ku ji kîneke
Kevnar ...
Kela ... dilên kurdane ..
Pir şerme ku navekî ...
Keç ...û nepak
Di nav me de
Bê hildan ...
Ew girawa
Setema gemarin ,...
Destên wan
Yên bi xwîn ...
Ji ber ayên bêsûca
Tora...
Bi serê wan de tîn...
Ya we çiye ?
Şofîniyên dil bikîn?
Piştî çend roj
Derbas bûn
Endamên ...komîta
Zordara
Li hev civîn
Xelekên tirsê ...
Şikestin
Tirsên setemê...
Pîkoliyê çûn
Dîsa ...bi hezaran
Kurd
Avêtin binê...zindana
Nepirsîn ... kî sûcdare...?
Lê kurd rabûn...
Li cîhanan
Ew gelê ku naraweste
Maf xwaze ... û... naweste
Av herrikî bin cilê
Yeka a yeka ...
Hin berdan
Piştî îskence ... û lêdanê
Tore anîn serê wan
Û hinjî ji wan ...
Kuştin .
Lê yên din jî

Bûn ber ... ferman
Dadgeh westandin
Bi bersîva ,....
Xelekên tirsê şikandin
Mîna şêra şikandin
Bûn sernûçên saloxî...
Çi mizgîn bû
Tev berdan
Çavên we ronîbin
Hejarên cîhan
Millet .. bi şahî
Û baweriyeke xurt
Çûn pêşiya wan
Welat ,...
Biryara fîxanê
Û dîlanê da ... çol
Û çiyan û
Berwaran
Gel himbêz kirin
Zarwên xwe
Lê ... jibîr nekirin
Kulên xwe
Vîlikên gemarî
Ji xwîn mija
Derhatin.... bi ne yarî
Başûrê biçûk
Dişewite ... dibe tiraf
Bi vî arî ...
Ev qelenê fedraliyê ye
Erê zore
Lê pak û çê ye
Ma gelo ...
Ev xwestek ....ya kê ye
Û ne ya kê ye .....? .

Arşek

Û du helbest ji yên (Kurdyar) hatin xwendin .
Û hin xortên dîtir helbestên xwe xwendin .
Pêşkêşkerê komê di nav re şevbihêrk dewlemend kir bi helbestê û ev helbestek ji yên Pêşkêşkerê heftyê ye :

Koma amûdê

Koma amûdê sema û koma we ye
Hiner û awaz stiran û tora we ye
De biparêzin xeml û xêza mîtanî
Da veguhêzin hesta we bi stiranî
Hesta zarokên li sînema şewitî
Hesta mirovên ji kerba dil perritî
Dîlan û kêfe ken û hovk û şano ye
Şîn û giriye ji bîranîna doye
Tîne bîra we navê boxê birîva
Û kevrê mozan û biratiya kirîva
Şêxê li doda û çîroka kum soro
Girê Şermola û pûtê nebî horo
Hoo ismîlo debêje hey felekkê
Bêje kanî lo tola birca belekê

dilyar

Û hindek ravekirin ji helbesvana hatin xwestin di babet û curên helbestê de wek: helbesta nûjen û helbesta bi pîvan û endazî .
17/11/2005/ şeva çarem mamoste (Dîlawerê Zengî) mijada wî li gel dîroka komelên kurd berya sala /1957/ an bû (berya anakirina partî dîmuqratî kurdistanî li başûrê biçûk) . û hin danin û stendinên dîrokî li dar ketin .

18/11/2005/ şeva pêncem lêkoler (Leheng) lêkolînên pîtolî di zanistiya derûnî('ilm elnefs) de bûn , bi hawakî zanyarî lêkolînên xwe şirovekirin .

19/11/2005/ şva şeşem mamoste (Bozan Berazî) : dîrok û abûr ,
ristek dîrokî : ji somer ta bi cenga cîhanî ya yekemîn , û rewşa abûrî di herêma (Amûdê) de da ravekirin .

21/11/2005/ şeva heftem lêkolerê kurd (Deham Evdulfettah) şeva dawî ji vî heftiya rewşenbîrî ya hêja bû.

Hin xalên ku bi kurte birî hatin tevdan :

1- Dîroka rewşenbîrîya Amûdê :
Rola Melle Ubêdullahê Hêzanî (Seyda) û rola Ḧicra wî û xwendekarên ku di wê Ḧicrê de li ber destê Seyda xwendina xwe ya feqetiyê bi dawî anîn , wek : Seydayê Melle Ebdulletîf , Seyda Melle Ebdulhelîm Sima'îl , Melle Mihemmedê Dîkê, Melle Şêxmûsê Qerqatî , Melle Elîyê Topiz, Melle Fethullah , Cegerxwîn û hinin dîtir jî .....

Rola vî Seydayê ronakbîr û şagirtên wî gelekî li jîngeha Amûdê û hawîr dora wê hebû .
Wilo jî rola wan rewşenbîrên ku piştî serhildana (Şêx Se'îdê Kal) ji ser xetê daketin bin xetê û li Amûdê hêwirîn û binecî bûn , wek:
Rşîdê Kurd , Melle Hesenê kurd , Qedrî Can, Evdê Têlo , Qedrî Cemîl Paşa, Ekrem Cemîl Paşa û hinin dîtir .....
Evan kesên hişyar û bîrawer bingehê çand û rewşenbîriya wêjeyî û siyasî li Amûdê bi cî kirin .

2- Danasîna zimên û giringiya wî boyî parastina nasnameya gellan
3- Rewşa zimanê Kurdî di vê qonaxê de :
   - Kar û xebata ku heta nuha jêre bûye .
   - Kêmasiyên wan berhemên rêzimanî yên ku li berdestê me ne (kurtebirrîya pitûkan ,pirrbûna navlêkirinên mijaran, têvelî û ne wekheviya navlêkirinên mijaran, ne wekheviya rastnivîsê …..).
   - Şarezayên zimanên biyanî û ezmûnên wan di warê sazkirin û pêşzistina zimanên xwe .
4- Kar û xebata ku ji me tê xwestin boyî çareser kirina arîşe û aloziyên zimên û sartkirina kêmasiyên wî .....
5- Pêwîstiya fêrbûna zimanê xweyê netewî û parastina wî ji windabûn û tunekirinê di bin durişma: (Zimanê xwe biparêzin û xwe jî bi zimanê xwe biparêzin .....!).

Li dûmahiya sîmînara xwe li ser konfiransa zimanê Kurdî ya ku li Amedê di navbera /17- 18/ yê meha /11ê de li dar ket , axivî û mijarên ku di konfirans de ber çav bibûn rave kirin û tiştên ku hatin gotin weku têbînî û encamname (Daxuyaniya dawî) , ew jî di ber çavên guhdaran re derbas kirin . Li dawiyê bersivên pirr pirsan da .

Amadeker: Ahmed Mihemmed / ceger@amude.com

Amûdê /26/11/2005